

SALIM Û 3 HELBESTÊN WÎ

✍ Hêmin OMAR

Navê wî 'Ebdurrehman Begî kurê Mihemed Begî qerecehennemî Kurê Ehmed Beg e, ji malbata Sahêbqiran e, di sala 1805an ji bajarê Silêmanî hatîye dinyayê. Malbata qerecehennem eslê wan ji bo Kurdistanê Îranê dizvrin, malbata Sahêb Qiran jî ji malbatên resenên slîmanî yêne, ev malbat xeynê Salim, Mistefa Begî Kurdî û Ehmed Hemdî Beg jî helbestvan bûne û ji malbata sahebqiran in.

Salim ji hucre mizgeftan xwendiyê, lê xwendin bi dawî neyînaye û nexwastiye bibe Melê. Helbestvan bi dirêjayiya jiyana xwe herdem nesax û nexoş bûye. Ji destpêka jiyana xwe mexlesa (Bîmar) bo xwe berbîjêr kiriye, piştî wê wek hêvîyek mexlesa xwe kiriye Salim bi wata saxlem û ne nexoş. Herwesa bi mexlesa (Rencurî) jî helbest nivîsandîne.

Helbestvan gelek çermeserî û nexoşî dîtine û her dinavbera Kurdistan û Îranê geriyaye, dema ku 'Usmaniyan Silêmanî xiste bin destê xwe, ew reviyê Îranê. Bi taybet piştî xirabûna emareta Babanê, rewşa derûniya wî xira bûye û di bajêra Taranê (Tahrane) gelek 'aciz bûye û eve jî di helbestekî da rengvedaye, dema ku dibêje:

Xozge demzanî le Tarana necatim key debê.

Koyê yarim Meşhed e ya menzillm her Rey debê

Helbestvan ne tenê her le Îranê mişextî bûye,

belku ketîte bajêrê Hille li Başûr a 'Îraqê. Piştî wê dizvre Silêmanî.

Piştî here mezin ji helbestên wî li ser mijara xirabûna mîrnişîna Baban bûye û di aliyê evînê jî helbestên wî di wê mijarêda hene.

Helbestên Salim ji aliyê rûxsar ji Xezel û Qesîde û pêncxiştekî pêkhatiyê, helbestê wî bi zimanê Kurdî û Farsî hene. Zêdetir bandora peyvên Farsî bi ser wî heye. Di despêka sed sala bîstem behsa Salim hatiye kirin, Emîn Feyzî di pertûka xwe (Encumenî Edîbanî Kurd) behsa wî kiriye û nimuney helbestê jî parve kiriye. Sala 2016 bi şîroveya Mela 'Ebidulkerîmî Muderîs û kurên wî, çapeka nû bo diwana Salim hat kirin.

Helbestên Salim piranî li ser kêşê 'Erûzî hatîne nivîsandin, zêdetir li ser behra hezec û remelêne. Herwesa çend helbestê Mulemme' jî nivîsandîne, lê tenê bi zimanên kurdî û farsî mulemme' nivîsandîne.

Bandora Nalî bi ser Salimî hebûye û Nalî qesîdek ji Salim ra şandiye û Salim jî bi qesîdek bersivê wî daye û bi qesîda Qurbanî Tozî Rêgetim hatiye nasandin ango dû çameyê nalî û Salim. Ji aliyê naverok jî, helbestên Salim wesfa evîndarî, civakî, helbesta hecû, helbesta mersiyê û .nîştîmanî û neteweperwerî jî heye

Salim li sala 1869 çuye ber rehmê xudê, li bajêra Silêmanî hatiye bin ax kirin.

(1)

Le sîne¹m da seday nallîn e bê to
Dillî zarim besê² xemgîn e bê to

Ebed wek min xemîş³ sahib wefaye
Refîq û hemdemî dêrîn⁴e bê to

Henase⁵y serdî min dênê zumistan
Grrey germî dillm hawîn⁶ e bê to

Demim tall û siruşkim şor⁷ e dayim
Tiriş rûm û qîsem şîrîne bê to

Dillm bax û gullim firmêskî all e
Behar 'umr û ecel gullçîn e bê to

Siruşkim qîrmiz û dîde⁸m sifîd⁹ e
Ruxim zerd û lîbasim şîn e bê to

Fereh raburd ebed bê to 'ubûr ka
Be rûy dillma xefet perjîn e bê to

Le çîng xem seyde e Salim wek kebûter¹⁰
Le dilliya mîxleb¹¹î şahîn e bê to

(2)

Elwîda' ey mullkî Baban elwîda'
Elwîda' ey cayî canan elwîda'

Muste'iddim¹² bo bîladî rafîzî
Elwîda' ey ehî îman elwîda'

Wek esîrî turkiman demben be zor
Elwîda' ey şahî xûban elwîda'

Deştî hîcrit tar e wek deryayî qîr
Elwîda' ey mîhrî rexşan elwîda'

Rûberrûy meşrîq deçim bo mullkî Rey
Elwîda' ey qîbleyî can elwîda'

Eşkî dîdem¹³ rengî gullnarî heye
Elwîda' ey narî pustan elwîda'

Sîhhetî da weslî to hîcrit merez
Elwîda' ey derd û derman elwîda'

Dill beraber zullfî to wazîh dellê¹⁴
Elwîda' ey sunbulistan elwîda'

Zexm¹⁵î dill bo abî peykan tîşne ma
Elwîda' ey tîrî mujgan¹⁶ elwîda'

Gerçî bo ehwallî Salim bê xemî
Elwîda' ey namusullman elwîda'

1 Sîne: sîng

2 Beşe: zor, gelek

3 xemîş: xem jî

4 Dêrîn: kevin, kon

5 Henase: nefes

6 Hawîn: havîn

7 Şor: sûr

8 Dîde: Çav

9 Sifîd: Sipî

10 Kebûter: Kotir

11 Mîxleb: Çîngol

12 Muste'iddim: Ez hazirim, Amadem

13 Eşkî dîdem: Avê Çavim

14 Dellê: Dibêje

15 Zexm: birîn

16 Mujgan: Birjang

(3)

Xozge demzanî le Taran ê necatim key debê
Ko¹yî yar e meşhed²im ya medfen³im her Rey⁴ debê

'Eyş¹²î wesll¹³im birde ser endûh¹⁴î hîcrîş serdeçê
Mewsîmî urdîbîhîşt¹⁵im dî demêkîş dey¹⁶ debê

Teyîyi Erzim bo neka ta rohî şahî Neqîşbend
Key be pêy pirr abillem wadîyi fîraq⁵it tey⁶ debê

Bo telîsmî rû biro şemşêrî rûte rast û çep
Ta degate genc¹⁷î husn¹⁸it peyk¹⁹î fikrim pey debê

Her kesê zanî le sozî nalle hallî derdî dill
Metllebî nabê hemû hallî le fehwa⁷y Ney⁸ debê

Ger be huccet²⁰ bê ruxim²¹ sabît deka sîdq²²î zemîr²³
Mayilî sêb²⁴î ruxit rengî be mîslî²⁵ bey²⁶ debê

Nêşî heyye⁹ zullfî Leyla raste Mecnûnkuş¹⁰ buwe
Xo gezîdey marî wa qet namirê her hey¹¹ debê

Min le neşe²⁷y camî le'l²⁸it mehşer²⁹îş nayême hoş
Camî wa Salim le dewra qîsmet³⁰î Cem³¹ key debê?

-
- 1 Ko:** menzil, cêh
2 Meşhed: Cihê şehîdbûn, bajêrê Meşhed ku turbê Îmam Elî Reza li wire
3 Medfen: Cihê defin kirin û bin ax kirin
4 Rey: navê bajêrekîye
5 Fîraq: cudayî
6 Tey: lûldan, Pêçan
7 fehwa: Naverok
8 Ney: amêreka muzîkêye
9 heyye: Mar
10 Mecnûnkuş: Mecnûnkuj
11 hey: zindî
12 'Eyş: jîyan
13 Wesll: geştiştin bi Yar
14 Endûh: xem û xefet
15 Urdîbîhîşt: Dûwem mehê Biharê
16 Dey: Mehê yekeme Zivstanê
17 Genç: Hezîne, gencîne
18 husn: Xoşikî
19 Peyk: Qasîd, Teter
20 huccet: Belge, Delîl, nîşane
21 Ruxim: Rûyê min
22 Sîdq: Rastî
23 Zemîr: Wîjdan
24 Sêb: Sêv
25 be mîslî: Mîna, Wek
26 Bey: Behê
27 Neşe: Xoşî
28 le'l: Kînayete li Lêv
29 mehşer: Roja heşrê
30 Qîsmet: Beş
31 Cem: Cemşîd